*ROJA ÇALAKIYÊ YA CÎHANÎ*

# *“Em Hemû YPJ ne!”*

*31ê Gulanê 2026an*

***Destkeftiyên tevgera jinan a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di bin êrişan de ne. Em ê di 31ê Gulanê 2026an de bi Roja Çalakiyê ya Cîhanî wan biparêzin!***

*Di 29ê Kanûnê de di navbera hikûmeta demkî ya Sûriyeyê û rêveberiya xweser a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de peymanek pêk hat, ji ve demê û şûn ve êrişên leşkerî yên li ser destkeftiyên şoreşa jin heta niha rawestiyane. Lê belê, êriş di astên siyasî û civakî de berdewam dikin. Di danûstandinên bi hikûmeta veguhez re civak û bi taybetî jin parastina destkeftiyên şoreşê dikin. – Bi mafê jinan, beşdariya siyasî û civakî ya jinan û cihêrengiya civakî re israrkirin helwestek e li dijî zihniyeta îslamîst û zayendperest.*

*Yekîneyên parastina jin - YPJ, bi hebûn û çalakiyên xwe van destkeftiyan temsîl dikin. Ji ber vê yekê, hikûmeta demkî ya Sûriyeyê hebûn û beşdarbûna wan di nava artêşa Sûrî de qebûl nake.*

*Di dozdeh salên borî de, YPJê bi têkoşîn, fedakarî û serkeftinên xwe îspat kir ku jin xwedî wê hêzê ne ku li xwe û civaka xwe xwedî derkevin. Wan bi serkeftî li dijî hêzên cîhadî yên wekî DAIŞê û îdeolojiya wan a dij-jin şer kir. Wan hişmendî bilind kirin û baweriyek xurt di nava civaka xwe de avakirin; nîşan dan ku dema mijar dibe avakirina saziyên demokratîk, jin di qadên leşkerî, siyasî û civakî de hêza herî pêş de ne. Wan pîvanên exlaqî û polîtîk di şer de parastin û her wiha di civaka xwe de ji bo exlaq û edaletê bûn mînak.*

*Bi vî awayî, wan ji bo gelek jinên li Kurdistan û Rojhilata Navîn bûn mînak û baweriya bi hêza xwe, hişmendî, perwerde û rêxistinkirina xwe, ew teşwîq kirin ku ji bo azadiya jinê bi biryardarî tê bikoşin. YPJ îspat dike ku jin li her derê xwedî kapasîte û mafê parastina rewa ya kolektîf in û bi vî rengî dikarin welat, gel û civaka xwe biparêzin.*

*YPJê pabendbûna xwe ya ji bo misogerkirina pêşeroja Sûriyeyeke demokratîk û azad parastina jinan ragihand. Em jî radigihînin ku em di têkoşîn û daxwazên wan de li cem YPJê ne: Di roja çalakiya xwe ya cîhanî ya di 30ê Gulanê de, em ê dengê van daxwazan bigihînin tevahiya cîhanê:*

*Divê YPJ wekî yekîneyeke parastina jinan û nirxên demokratîk di nava artêşa Sûriyeyê de cih bigire!*

*Di 31ê Gulanê de bi çalakiyên protestoyî yên afirîner û cihêreng beşdarî Roja me ya Çalakiyê ya Cîhanî bibin!*

*Dengê destkeftî, têkoşîn û daxwazên YPJê belav bikin!*

*Bang li rêxistinên din û dostên xwe bikin ku tev li kampanyayê û roja çalakiya cîhanî bibin!*

Bijî YPJ, sembola rûmet û têkoşînê! Em hemû YPJ ne! YPJ hebûna me ye!

---

*Kampanyaya "Em hemû YPJ ne! YPJ hebûna me ye!" ji aliyê Platforma Hevpar a Tevger û Rêxistinên Jinan ên Rojava û Sûriyeyê, di nav de Kongra Star, hate destpêkirin. Agahiyên li ser kampanyayê û materyalên derbarê destkeftî û têkoşîna YPJê de bi Inglîîzî li ser malpera Kongra Star û li malpera „Women Defend Rojava“ dikarin werin dîtin.*